

RONÎKIRINEK LI SER ÇEND ALÎYÊN ROMANA *SÎBERÊ* YA WEZÎRÊ EŞO

Kurte

Hikûmeta Ermenistanê piştî mirina yekem romannûsê kurd Erebe Şemo, li ser wî xelateke edebî kifş dike û Wezîrê Eşo ji ber berhemên xwe yên kurdî yên giranbiha dibe yekem xelatgirê Xelata Erebe Şemo ya Yekîtîya Nivîskarên Ermenistanê. Ji hingê heta dawîya emrê xwe Wezîrê Eşo afirandinên xwe yên edebî û lêkolînên xwe yên dîrokî û zan-yarî berdewam kir û wekî romannûs û çîroknûsekî edebîyata kurmancî ya Kafkasyayê cihê xwe wergirt. Ev nivîsar lê dixebite ku romana Wezîrê Eşo ya bi navê *Sîberê* di çarçoveya çend layenên wekî zeman, mekan û avakirina karakteran de binirxîne. Nivîsar ji bilî vê, bi boçûneke rexneyî li tevger û biryarên karaktera bi navê *Sîberê*, li têkilîya wê ya bi fikra baviksalar û feodalîteyê mêzde dike û berê xwe dide îdealîzekirina karakterên romanê ku wekî “ambalajkirî” tên xuyanê.

Peyvên Sereke: Sîber, Wezîrê Eşo, Kafkasya, kurmancî, karakter

Pêşekî

Şer û hokerên polîtîk, etnîk û dînî bûn sebeb ku pareke mezin ya kurdên serhedê berî damezirandina Tirkîyeyê ji welatê kalûbavên xwe biqetin û herin li xerîbîyê li welatê Sovyetê hêwir daynin. Berawird li gel yekûna wan a hejmarî ya kêr, kurdên Kafkasyayê bi zimanê xwe yê ku bi perwerdehiyeke birêkûpêk ve nebibû hinkufê zimanên cînar, werar û geşedaneke nedîtî di warê berhemên edebî û berhevkarîya folklorîk de pêk anîn; di maweyeke kin de bi saya wan, edebîyata kurdî ku li her çar parçeyên welêt bi dêsmana xwe ya parçebûyî, bêyî ku piştevanîyê ji pêkhatayên xwe re bike, li Yekîtîya Sovyetê û pey re jî li dewletên piçûk

ên nû-damezirandî ku mafên çandî û hunerî dabûn kêmeteweyan, di cureyên edebî yê çiyawaz de (roman, çîrok, şano û werger) dane-heweke dewlemend bi dest xist û bi derfetên kêmbêr zor dan şîyana afirînerîya zimanê li pexşanê ku kurmançiyê heta wê demê di cureya romanê de xwe lê neceribandibû. Edebîyata kurdî ya Kafkasyayê ku li welatê xeribîyê geşedan û werareke dilxweş pêk anî, ji ber sînor û berjewendiyên siyasî, bi demeke dirêj, bi qewlê Fêrîkê Ûsiv ku ji bo sewta xwe ya şairiyê gotibû, “ax dibe binice, çemê min li van deran, û neçe negihîje tu oqyanûs û behran”¹. Xebera şairê gewre Fêrîkê Ûsiv bû, demeke dirêj çemê wî *neçû*, *negihîşte tu oqyanûs û behran*.

Piştî avabûna dewletên nû, têkilîya di navbera edebîyatên kurdî de qut bû û li Bakur û Sovyetê afirandinên edebî li hevdu tesîr nekirin ji ber ku heta demeke dereng ji hevdu agahdar nebûn. Heta nika jî, bi sedan berhemên ji cureyên têvel yê ku demên cuda li Kafkasyayê bi tîpên krîlî û latînî hatine nivîsandin ji bo kurdên li Tirkîyeyê bi rihefî berdest nabin. Ji aliyê weşanxaneyên kurdî ve vê axiriyê hewleke xurttir heye ku van her du pişkên edebî yê kurmançî bigihîne hevdu lê dîsa jî duserîbûna ku cihê xwe qayim kirîye zû bi zû yekîtîya xwe pêk nayne. Aydogan vê rewşa duserîbûn û duletebûnê wekî “wêjeyê li ser du kokan” bi nav dike û wiha amaje pê dike: “Wêjeya kurdî ya ku piştî çapkirina rojnameya Kurdistanê bi rêya çapemeniyê ve li ber xwe da, di dema xwe ya nûjen de xwedan du kokên ku ji hev gelekî cuda ye. Her di dema ku Hawarê li Şamê dest bi weşana xwe dikir de, pêleke wêjeyî ya din di warê pexşanê de di nava kurdên Sovyetê de, bi taybetî li Ermenistanê, dest pê kiribû.”² Hingê hewldana şexsî ya Hecîyê Cindî çêdibe ku dixwaze bi xwediyê Hawarê Celadet Bedirxan re bikeve têkilîyê û bi rêya nameyan wan ji xebatên li Ermenistanê agahdar bike. Em ji nivîsa Celadet a di Hawarê de pê dizanin wekî ku Hecîyê Cindî di vê hewldana xwe ya takekesî de bi ser ketîye û saloxê barûdoxa xebatên kurdî daye. Mixabin, ji ber van nameyan, ew ji aliyê dewletê ve tê girtin ku Stalin lê desthilatdar bû û salekê di hepsê de dimîne ji ber vê helwesta xwe.³ Lewma salên ewil ku di warê hilberîna ewil de afirandinên edebî bixêrûber bûn, ji ber tengasî û rêgiriyên her du letên edebîyata kurmançî negihan hevdu. Îhtimaleke mezin, eger ev tengasî li pêşîya vê para edebîyata kurdî tune bûya, serencameke lap cuda wê ji bo edebîyata kurmançî derketa holê. Dîsa jî ne dirust e meriv pêwendîya kêmbêr a di navbera her du parçeyan de bi tenê li ser rewşa berhemên çapkirî binirxîne û rola girîng a Radyoya Êrîvanê bi vî rengî piştguh bike. Radyoya Êrîvanê, bi

1 Fêrîkê Ûsiv, *Hesretdefter*, amd. Firîda Hecî Cewarî, Dîyarbekir, Lîs, 2015, r. 112.

2 İbrahim Seydo Aydogan, *Guman 2: Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, Rûpel, Stenbol, 2014, r. 106

3 Temûrê Xelîl, *Antologîya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê*, Na, İzmîr, 2014, rr. 130-131

weşana xwe ya kurmançî ve bi dehan salan xwe gihandê hezaran û têgihîştineke giştî derheqê kurdên li Ermenistanê de çêkir li gel xizmeta ku kir ji bo parastin û xurtkirina ziman di nav kurdan de.

Kurdên êzidî, bi rastî jî di cureyên roman û kurteçîrokên de ji bo kurmançiyê pêşdeçûnên berçav tomar kirin. Lêbelê wekî ku li we xwîneran jî eyan e, li rojhilatê sînorê serhedê bi taybetî li Ermenistanê, ne tenê cureyên edebî herweha xebatên girîng ên berhevkarîyê yê wekî çîrok, kilam û serpehatiyên gel, şanogerî, radyo, rojnamegerî, materyalên dersan û hwd. gişk xwediyê tesîreke erênî bûn ji bo xurtbûna xebatên edebî li wir. Rast e, Yekîtîya Sovyetê ji pir welatan pêk dihat lêbelê li gor Reşîd ku ji Aloiane neqil dike, “gava gilî tê ser wêjeya kurdên Yekîtîya Sovyêt, gerek em berî gişkî wêjeya kurdên komara Ermenistanê bi bîr binin, ji ber ku 80-90 % rewşenbîrên kurdên Yekîtîya Sovyêt, bi taybetî kesên bi çand û wêjeya kurdî ve bibûn giro, ji vê komarê bûn.”⁴ Li gor Reşîd du sebebên vê fenomenê yê sereke hene; sebebê yekem ew e, wekî li Ermenistanê tevgera kurdan a neteweyî hertim jî xurt bûye, paşê jî Hikûmeta Komara Ermenistanê bêtir piştgirîya pêşveçûna ziman, çand û wêjeya kurdan kirîye.⁵

Divê neyê jibîrkin ku hokera ku rê li ber pêşdeçûna edebî vekir perwerdehiya bi kurmançî bû; bi vê yekê gelek nivîskarên kurd di piçûktîya xwe de bi rêya perwerdehiya bi kurmançî ziman û çanda xwe hîn bûn û pey re dest bi nivîsandinê kirin. Herçiqas Împeratorîya Rûsyayê siyaseta dagirkirin û kolonyalistê meşandibe jî, ji aliyê kulturî, aborî û parastina hinek mafên gelên bindest de pêş de bû.⁶ Ev pêşdeçûn û hilberîna çanda kurdî li gor politikaya Lenîniyê ya miletîyê çêdibû ku bona menfeeta sosyalîzmê dihat meşandin.⁷ Dîsa hevterîp li gel vê fikrê ku menfeeta sosyalîzmê wekî pêşmercek dida ber hilberîna ziman û çanda kêmaran, edebiyata kurdî ya Kafkasyayê jî di bin sîbera sosyalîzmê de ku li ser gelên cihê hatibû ferzkirin, carcar bi rizadilî û carcar jî bi otosansûrekê di çarçoveya realîzma sosyalîst de berê xwe dida vegêranên li dor propagandayên îdeolojîk, kolektîvîzm, rexneya feodalîteyê, çîna karker û hwd.

Divê em mafên çandî tenê bi kurdan re bisînor nekin, wekî hemû kêmarên Sovyetê kurdan jî tenê ji wan mafên giştî îstifade kiribû. Jixwe bi hatina Stalin re, ji bo demekê rewşa siyasî ber bi xerabbûnê diçe. Jiber koçberkirina kurdan ber bi Asyaya Navîn demografi û derfetên kurdên li Ermenistanê jî diguherin. Li Sovyetê xêncî xebatên ku bi kurdî ji aliyê

4 Tosinê Reşîd, “Sovyetler Birliğinde Kürt Edebiyatı” *İnatçı Bir Bahar*, Vecdi Erbay (Ed.), Ayrıntı, İstanbul, 2012, r. 203.

5 Tosinê Reşîd, *h.b.*, r. 203.

6 Eskerê Boyîk, *Çanda Kurdên Sovyêtê*, Deng, İstanbul, 2012, r. 9.

7 Wezîrê Eşo, “Konferansa Kurdzanîyê ya Yekemîn li Yêrîvanê”, *Nûbihar*, j. 126, 2014, r. 6.

kurdan ve hatine kirin, ji alîyê kurdologên rûsan ve birrek xebatên giranbiha li ser folklor, ziman û çanda kurdî hatine kirin. Xebatên li ser ziman û edebîyata kurdî li Sovyetê xwedîyê dîrokeke kevn û berçav e. Di vê derbarê de Omarkhali dibêje wekî şaxeke serbixwe ya Xebatên Rojhilatnasîyê, Xebatên Kurdî nivê sedsala 19an li Împeratorîya Rûsyayê teşe girtîye.⁸ Herweha li gor Omarkxali ji alîyê Xebatên Kurdî de YKSS li dinyayê rêza yekem de ye û ew Rûsyayê wekî “dergûşa Xebatên Kurdî” bi nav dike.⁹ Dema meriv li xebatan dinêre ku li Rûsyayê berde-wam in, berçav e ku ev angaştê Omarkxali hîn jî derbasdar e.¹⁰ Îcar ji ber ku ev nivîsar di çarçoveyê teng de tenê bala xwe dide Sîberê, xebatên rojhilatnasan û nîqaşên li ser xebatên kurdî yê Sovyetê dê li vir derveyî behskirinê bin.

Li Sovyetê, berê pêşîn bi *Şivanê Kurmanca* (1935) ya Erebê Şemo (1897-1978) romana kurdî dest bi geşedanê kir û pey re Hecîyê Cindî, Elîyê Evdirehman, Egîdê Xudo, Şehîdê Îbo, Ahmedê Hepo, Ezîzê Gerdenzerî ev cure pêş ve birine. Wezîrê Eşo¹¹ ku ji alîyê ziman û terza xwe ya xweser ve di vê parçeyê edebî yê kurmancî de roleke berçav lîstîye, cara ewil di sala 1976an de bi novêla xwe ya bi navê *Mîzgînîyê* dest bi afirandina xwe ya edebî dike û heta dawîya emrê xwe ew her bi edebîyat, lêkolînên li ser dîrokê û wergerê re mijûlîya xwe berdewam dike. Ew, nexasim di cureya kurteçîrokan de pêş ketîye. Lêbelê heta van salên dawî ji ber ku pirtûkên wî ji bo kurdên li Tirkîyeyê ne berdest bûn,

8 Khanna Omarkhali, and N. Mossaki. “A History of Russian Kurdology: With a Brief Literature Overview”, di nav: Hennerbichler, F. et al. (eds.), *Wiener Jahrbuch für Kurdische Studien. Die Geschichte von Kurdischen Studien und Kurdologie. Nationale Methodologien und transnationale Verflechtungen*, Österreichische Gesellschaft zur Förderung der Kurdologie, Wiener Verlag für Sozialforschung, Vienna, 2014, rr. 140-177.

9 Omarkhali, *h.g.*, r. 141.

10 Ji bo xebatên ku heta van salên dawî hatine kirin, bnr. Sirkeci, Ibrahim & Andrej Pîrvara. “*Kurdish Studies* in Russian Language: 1917-2017”, *Kurdish Studies*, [S.l.], v. 5, n. 2, r. 187.

11 Pêşiyên Wezîrê Eşo li gor gotina wî ji navçeya Elaşgirê (Zêtk) cîhil dibin diçin Qersê li gundekî Dîgorê bi cih dibin. Wezîr bi xwe li paytexta Gurcistanê Tiflîsê ji dîya xwe dibe, paşê cîguhastî gundê Pampê dibe. Ew di sala di 1934an de fakulteya dîrokê ya Zanîngeha Êrîvanê xelas dike. Di navbera salên 1958–1961î de li gundê Pampê wekî serokê dibistanê kar dike. Salên 1964–1983an weke redaktor û redaktorê sereke yê polîtîkî di radyo, televîzyon û weşanên Ermenistanê de kar dike. Salên 1983–1994an karê redaktorîkirinê û wergerîyê di beşa weşanên kurdî ya Radyoya Êrîvanê de bi cî tine. Xêncî bi dehan nivîsarên li ser dîrok, kesayetên kurd û çanda kurdî, wî pirtûkên lêkolînê yê wekî *Dosya Barzanî Sandoqa Stalîn ya Polayî da* (2007), *Kurdzanê Mezin: Qanatê Kurdo* (2010), *Simoyê Şemo: Jîyan û Kar* (2013) û *Pirtûkên Kurdî: Li ser Kurdan, li Ermenistanê* (2016) jî nivîsandine. Herwisa Wezîrê Eşo ev berhemên edebî yê hêja li dû xwe hiştine: *Mîzgînî* (1976), *Dengbêj Kal Bibû* (1983), *Pamp-Sîpan* (1986), *Parîyê Berdamayî* (2008), *Sîber* (2016), *Qirme* (2016), *Tosinê Ūşan* (2016), *Îtbarî* (2016), *Hosta Hovannes* (2016). Ew di sala 2015an de bi rehma Xwedê şa dibe.

raya giştî ya kurdîyê bi têra xwe derheqê wî û xebatên wî yên biqîmet de saloxdar nebûn.

Xweşbextane, di sala 2016an de çend romanên wî bi carekê ji Weşanxaneyê Lîsê derçûn û gihiştin ber destê xwendevanên kurmançî. Wezîrê Eşo di jîyana xwe ya kurdî de karên wekî werger, nivîsandina çîrok, roman û pîyesê de xebatên hêja dane lêbelê di emrê xwe de tu caran dest bi nivîsandina helbestan nekirîye.¹² Wezîrê Eşo, bi xebatên xwe yên ewil yên edebî ve di dema xwe de balê dikişîne ser xwe. Piştî mirina yekem romannûsê kurd Erebe Şemo, Hikûmeta Ermenistanê li ser navê wî xelateke edebî kifş dike; nivîskarên ku berhemên kurdî yên giranbiha afirandine û weşandine di vê çarçoveyê de tên diyarkirin. Rind e ku behs bête ser xelata pêşîn ku nivîskar Wezîrê Eşo stendîye¹³. Xelata Erebe Şemo ya Yekîtîya Nivîskarên Ermenistanê ku layiqê Wezîrê Eşo tê dîtîn, ji bo destnîşankirina şexsîyeta wî ya edebî mihim e. Armanca vê nivîsarê ji çend alîyan ve nixandîna û hilsengandina berhema Wezîrê Eşo ya bi navê Sîberê ye.¹⁴

Kurteya Romanê

Roman aqûbet û serpêhatîya keçeke bedewa dinê ya berzewac Sîberê bi xwîneran re pêşkêş dike. Sîber delalîka ber dilê dêûbavê xwe, hezkirîyê ap û amojina xwe û herweha delaltirîn keça xama û xwendî ye li gund. Ji ber bedewî û delalîya wê, tu kes li gund xwe hinkûfê malbata Sîberê nabîne ku bê ji bo kurê xwe wê bixwaze. Dema ku Sîber dibê hejdehsalî, rojekî ji gundekî cînar xwazgîniyên wê tên mala bavê Sîberê. Eto, bavê Sîberê, naxwaze qîza xwe bêyî xwebera apê Sîberê Emo bide mêr. Îcar, xwazgîniyan jî bi xwe re Arşak anîne ku kesekî qedirbilind e û Eto wî ji Tiflîsê nas dike. Arşak li mala Eto ji bo xwestina Sîberê bi kefildarî li ser navê Xudo xeber dide. Xudo yê bavê Temir, kesekî biesk, dilxerab, xerifî e ku ji roja ewil de naxwaze Sîberê ji bo kurê xwe bixwaze. Herçiqas ji rabûn û rûniştin, ji xeberdana xwe ve Xudo xwe diyar bike jî, Eto ji ber xatirê Arşak qayîl dibê ku qîza xwe ji roja pêşîn de bide Temir bi nîşanî û qelenekî bi qasî çil mihên doşanî û du xelatan.

Di roja xwazgîniyê Sîberê de, piştî xwarin, vexwarin û xwatirjihevwestinê, Xudo ji bavê Sîberê Eto re dibêje “-Te qelenekî rind ji min çopand, ha”. Li ser vê gotinê û tevgerên Xudo, Eto û xanima wî li ser biryara xwe ya nîşankirin û qelenbirinê poşman dibin lêbelê ji tirsê ku “xelkê çi bibêje?” nîşaniya qîza xwe bi şûn de nadin. Rojekî dema zavayê nû tê serdana mala xezûrê xwe, Eto û xanima wî ji rabûn û rûniştina wî, ji xeberdanên wî qayîl dibin, dilê wan hinekî rihet û baristan dibê.

12 Temûrê Xelîl, *Antologîya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê*, Na, Îzmîr, 2014, r. 270.

13 Eskerê Boyik, *Çanda Kurdên Sovêtê*, Deng, İstanbul, 2012, r. 125.

14 Hemû jêgirtinên vê gotarê ji vê pirtûkê ne; Wezîrê Eşo, *Sîber*, Lîs, Dîyarbekir, 2016.

Piştî demekê, wexta ku Xudo bergindê çil mih û kaviran de ku qelenê Sîberê bû ji Eto re kavirên kelax û papaxekî bi lekeyan lewitî tîne û bi ser de jî gotinên neçê dike, Eto hemû nîşanî û xelatan bi tevî pêz li Xudo vedigerîne. Lê sibetirê Temir ê kurê Xudo ango zava, dîsa nîşanî û xelatan ji bo mala bavê Sîberê tîne û bavê xwe xerab derdixe û dibêje ew “xurifî” ye û “ji ber temenê mezin xwe winda kirîye”. Eto dîsa bi vê tevgera Temir qayîl dibe û xelat û nîşaniyan hildidin. Tabî, di vê navberê de em haydar nabin ku Sîber derheqê van hemû bûyeran de çî difikire.

Piştî çend problemên bi vî rengî roja daweta Sîberê tê, herçiqas roja siwarkirinê ne li gor adetên êzidiya û daxwaza Eto be jî malbavê wê tînin Sîberê siwar dikin û dibin gundê malxezûranê wê. Pey re piştî demeke ne zêde dirêj bedewîya Sîberê hêdî hêdî winda dibe eynî wekî “mastê parzûnkirî ku şûjî jê diçe, dadiwerive”. Malxezûranê wê jê daxwwaz dikin wekî nivê cihêzê xwe hilde, bide baltûza xwe. Piştî çend mehan malbavê Sîberê bi ser wê de diçin, halê wê yê neçê dibînin lêbelê Sîber gazinan ji rewşa xwe nake. Piştî ku mala bavê wê ku bi rengêkî nebaş tîpêşwazîkirin, vedigerin Xemo tehdelan li Sîberê dike, maneyan lê digere, nav û nûçika lê dike. Piştî wextan Sîber êdî li ber xwe nade û diçe qulçeke tarî ya tewleyê de kab davêje stûyê xwe û xwe dadiliqîne. Heta pê dihesin dikin hewar û hêwirze, Sîber dibe dareke hiş û hola. Pey re jî gundê malxezûranê Sîberê, Gulnaz tê û serpêhatiyên xwe yên bi Sîberê re, bi malbata wê re parve dike. Em bi saloxên Gulnazê rewşa Sîberê ya berî mirina wê hîn dibin. Sîber jî ber ku nexwestîye navê xerabîyê li ser xwe û malbata xwe bike, xwe darde kirîye.

Zeman û Mekan

Di dinyaya çîroksazîyê de zeman û mekan bi bûyer û tevgerên karakteran re têkildar e, li vegêranê de li hev tîpêşwazîyê bermehê nîşan didin; di dinyaya rastîn de jî jixwe rewş û bûyerên ku rû didin bivênevê li astekî li bin neqşa zeman û mekanê de teşe digirin. Herwisa xwîner dema nivîsandina berhemê dide ber bûyer û tevgerên berhemê û wan li pîvana pêbawerîyê dixê. Dema nivîsandina berhemê jî aliyê tema, şêwaz, babet û bergehê ve bandorê li berhemê dike; reng û rûyên wê demê alav û hizrên serdest ên demê li perekî vegêranê de xwe dide der. Hizr û polîtîkayên serdest yê dewrê, dab û nêrîtên civatî, jîyana rojane û bi gelemperî hemî rengên dewrê hem di asta ziman de li hilberîna qalib û gotinên zimanî re digunçe, hem jî ji aliyê jîyana sosyo-polîtîk a karakteran ve dibe kartêker; karakterên afirandî ku di nav hevîrê xwe de (ku hokerên navborî dihewîne) tîrş dibin.

Di derbarê wextên girîng ên çîroksazîyê de Tekin amaje pê dike ku “tabloya zeman ya romanekî, berê pêşîn wekî “wexta bûyerê” û “wexta vegotinê” li ser du asta teşe digire. Herweha ew pê de diçe û dibêje:



“bûyereke di demeke dîyar de diqewime (wexta bûyerê), ev bûyer piştî demekê ji alîyê romannûs ve tê bihîstin/zanîn, dîsa heman bûyer di demeke dîyar de tê bidefterkirin (wexta vegêranê) û dîsa di demeke dîyar de (maweya vegêrandinê) tê pêşkêşkirin û ravekirin.¹⁵ “Berhema edebî, ji alîyê çawanîyê ve navgîneke ragihandinê ye. Di her ragihandinê de, hebûna şandîyar û wergirekî asayî ye. Dema nivîsandinê ew mawe ye ku hunermend ango şandîyar wextê xwe ji bo pêkanîna berhemê xerc dike. Ev bi zemanê çîroksazîyê (*itibarî*) re ne têkildar e; bi teqwîm û saetê ve tê pîvandî. ”¹⁶ Zemanê ku berhemê de hatîye afirandin, ji bo destnîşankirin û ravekirina taybetmendî û fêma dewrê girîng e. Û helbet zemanê ku li dor çîroksazîyê konê xwe vegirtîye ango zemanê di nav romanê de bivê-nevê li gor tercîha afirînerê berhemê hikmê xwe nîşan dide ji bo romanê pêkhatêyeke mihim e. Forster di vê derbarê de dibêje “di romanê de pêgirîya bi demê re mecbûrî ye. Tu roman nikare bêyî wê bête nivîsandin.”¹⁷ Dîsa derbarê têkilîya xurt a di navbera çîroksazî û zemanê de Tekin dibêje “ne mimkun e ku meriv hunera romanê li derveyî zeman bifikire”¹⁸

Di Sîberê de maweya di navbera “wexta bûyerê” û “wexta vegotinê” zêde ne dirêj e; alav û îmkânên ku di vegêranê de tê dîtin derbarê dema xwe de zanyarîyan pêşkêş dikin. Lêbelê derbarê Sîberê de divê behsa “maweya vegêranê” bête kirin; maweya ku bi nivîsandina nivîskar ve dest pê dike heta dema ku nivîsandina berhemê diqede. Wekî xwîner em di derbarê pêvajoya nivîsandina berhemê de ne xwedîyê zanyarîyên teqez in û nizanin halê dawî yê berhemê zêdetir di kîjan wextê de teşe girtîye. Helbet ji deqa çîroksazîyê meriv naşê zemanê ku tê de çîrok derbas dibe bi rehetî pê derxe, lêbelê dîsa jî eger ji bûyer û dab û nêrîtên li kar, bikaranîna xizek an jî firxûnan, nebûna telefonê û awayê siwarkirina bûkê li nav çîroksazîyê bête nihêrîn, derdikeve holê ku bûyera metnê di demeke nêzîkî mêjîyê destpêka nivîsandina berhemê (1979) derbas dibe ne ku dema qedandina berhemê (2007). Sermeselê cihekî de wiha tê gotin “Di wî zemanî de tunebûna avtomobîlan jî li gundan rola xwe a neqenc dilîst” (r.57). Ev maweya dirêj a nivîsandinê (28 sal), ji alîyê vegotinê ve guherîn werareke zimanî li ser berhemê çêkirîye. Zimanê berhemê, lihevanîn, hevokên kompleks û qalibên folklorîk ên xurt ve xwe nîşan dide. Lêbelê ji alîyê bikaranîna qalib û rastnivîsê ve dîyar e ku desttêwerdaneke edîtoriyal li ser berhemê çêbûye. Dema ku berhem

15 Tekin Mehmet, *Roman Sanatı 1 Romanın Unsurları*, Ötüken Neşriyat, İstanbul, 2016, r. 131.

16 Şerif Aktaş, *Anlatma Esasına Bağlı Edebi Metinlerin Tahlili: Teori ve Uygulama*, Kurgan Edebiyat, 2015, r. 50.

17 E. M. Forster, *Roman Sanatı*, (Wergera ji bo tirkî: Ünal Aytür), Milenyum Yayınları, İstanbul, 2016, r. 67.

18 Mehmet Tekin, *h.b.*, r. 138.



hate weşandin (2016), ji ber ku nivîskarê berhemê Wezîrê Eşo jî hê sax bû, ev jî tê wê wateyê ku guherîna zimanî ya ku li ser berhemê hatiye kirin li gor dilê wî bûye.

Di romanê de maweya ku vegêran lê bi cih bûye salewext e; ji rojêke zivistanê ya ku xwazgînîyên Sîberê tîst dest pê dîke heta destpêka zivistanêke din ku jineke nasê Sîberê ye, tê derbarê paşxaneyê mirina wê de bi malbatê re xeber dide. Wate, bûyerên ku di nava salekî de pêk hatine bûne mijara sereke ya romanê; xwazgînî, standîna qelen, dawet û mirina Sîberê. Di romanê de hêmanên ku wextê destnîşan dikin bi vî teherî ne: “Çend roj jî bihurîn”, “ji roja nîşankirina Sîberê çend roj bihurîn”, “ew roj ji bo bûk û zavê rojêke bêxêr e, gunê ye, qedexê ye. Çima ne Êzdî ne?”, “piştî çend rojan” (r.56), “Havîn jî hat; meha havînê a navîn bû” (r.83), “zivistan jî hat” (132), “zemanek jî hat” (r.122), “roja çarşemê bû” (r.57). Xulase roman sala rasteqîn ya bûyeran nade der û bi îfadeyên demê yê rojane an jî yê di derbarê demsalê de wexta vegêranê dîyar dîke û xumamîya li ser sala bûyerê ranake; “berêvarekê bû” (r.37), “Rojekê jî” (r.46), “esir bû” (r.128), “zivistan jî hat”, (r.132) “rojêke ji rojên wê zivistanê” (r.133), “berî çend hefteyan” (r.37) û hwd. Herweha, vegêran li gor dema kronolojîk li ser xetê rast berdewam dîke û bi gellempêrî çiva nade xwe û guherbarîya demê çênake û yeknesakîya xêza demê xerab nake heta ber bi dawîya romanê. Tenê piştî mirina Sîberê, dema jineke bi navê Gulnazê ku hevaltî bi Sîberê re kirîye tê malbavanê Sîberê û derheqê wê de êpêce tiştan dibêje ku xwîneran heta wê demê nebihîstîye, zeman bi vegotinên wê ve diçe berî mirina Sîberê.

Mekan, wekî pêkhatîyeke sereke ya avakirina çîroksazîyê, berhemên edebî de bi navê xwe yê rastîn an jî xeyalî bi karakterên çîrokê re di nav têkilîyeke xurt de ye; carna bi hebûna xwe ve rê li pêşîya bûyeran digire, hindê caran jî rola xwe di pêşketin û herikîna çîroksazîyê de dilîze û vegêran û karakteran li ber çavên xwîner dixe dilqekî rasteqîntir. Mekan “bi qasî ku li rêzebûyer û karakteran tesîr dîke parçeyêke bitûnê ye.”¹⁹ Bi saya mekanê, hem vegêran di hişê me de dîtbar dibe û tê xuyanê hem jî nêzîkî pêbawerî û rasteqînîyê dibe.

Di Sîberê de, qewam li gundekî kurdên êzîdî li Ermenistanê derbas dibe û herweha herçiqas bûyer lê neqewimîbe jî em pê dizanin ku malapê Sîberê li bajarê Tîblîsê, li Gurcistanê rûdinin. Wekî piranîya romanên din ên din bûyera Sîberê jî li parçeyê xaka kurdan a li Ermenistanê derbas dibe. Mekanê vegêranê, gundekî kurdan e ku navê wê nayê hildanê, ne gundekî zêde giran e û dorhêla wê çend gundên din ê kurdan jî hene. Jîyana gundewarî ya bi adet û toreyên kurdî ve xemilandî, mijûlîya xwedikirina pêz, mêvandarî, teswîra raxistina sifreyan ji bo

19 Philip Stevich, *Roman Teorisi*, (Wergera ji bo tirkî: Sevîm Kantarcioğlu), Akça Yayınları, Ankara, 2004, r. 264.

mêvanan, adetên xwazgînî û siwarkirina bûkê li ber çav e. Tekin dibêje romannûs insûra mekanê:

- bo danasîna dorhêla ku bûyer lê diqewime
- bo xêzkirina karakterên romanên
- bo nîşandana civatê
- bo afirandina atmosferê

dikare bi kar bîne û ew, dema ku bûyeran dişikilîne dikare yekî ji van tevî bike an jî çend heban li ber çavan bigire.²⁰ Herçiqas li gund derbas be jî, wekî mekanekî servekirî teswîr û nitirandina xwezayê li serê beşên bênav ên romanê li çend cihan hatîye kirin berîya ku bûyera sereke ya beşê bête pêşkêşkirin:

“Berêvarekê bû ringeringa firxûnekê a çarterekê û du hesp lê girêdayî hat li ber derîyê Eto sekinî, ji ber ku xizek êdî li ser wê rêyê nedixebitîn a ku belekî ketibûnê. Lê li keraxê rê, li ristan û çiyayan hê berfê som girtibû, kêmbibû, nicîya bû, lê hê belekî neketibûnê” (r.37)

Vegêran zêdetir giranî dide li ser têkilîyên di navbera karakteran de, dudilîya Eto û xanima wî, pevçûna di navbera adet û daxwazên şexsî de ku biryarên karakteran dixê bin tesîra xwe. Di romanê de bi taybetî dema raxistina sifreyan de li çend cihan, xwarin û pêxwarinên ku ji bo mêvana tên raxistin bi hûrgilî tên behskirin. Ev yek li xwîner hem atmosferê diafirîne hem jî çanda civatê nîşan dide. Bo nimûne, ji xwazgîniyên Sîberê re sifreyeke bi vî karî tê raxistin;

“Nan danîn; nanê loş î genimî, pelawa birinc, goştê mirîşkan li ser, penêrê beravêtî, sêv, menderîn, gûz û findeq û hilbet, araqa Gurcistanê a Çaça, şeraba Kaxêtê a wekî xwîna bêvilan sor ku ev hemûşkan Emo û jinê herweha ji mala Eto, zarên wî, ji ber û mêvanên wî re salê çend caran bi xwe re dianîn an jî ji merivên din re bi rê dikirin, nedihîştin alkol, fêkî, çerez û şîrinayîyên wê malê ji hev biqetin.” (r.26)

Îdealîzekirina Zêde ya Karakteran û Sîya Sîberê

Karakter li gor îmkanên dinyaya xwe ya çîroksazîyê bi taybetmendî û xususîyetên xwe ku li me merivan zêde dûraqil nayên xuyanê; bi dilqê meriv, alav an jî ajalekî de bi ziman dikeve û çîrokê ji me re qiset dike an jî serborîya xwe bi me re parve dike di nav dinyaya çîroksazîyê de ku dişibe dinyaya me ya rasteqîn. Helbet, bi tu rengî ne pêkan e reng û rûyên wan, rabûn û rûniştina wan, fikr û ramanên wan ji sedîsed bişibe ya merivan, jixwe çîroksazî jî bi temamî bi armanceke bi vî rengî ranabe. Dîsa jî babeta cure û pênaseya tîp û karakteran di nav roman û kurteçîrokan de ji mêj ve di nav rexnegiran de hatîye nîqaşkirin û nîrx-

andin. Lêbelê pênase û polînkirina wekî dûz (*flat*) û gilover (*round*) ya ku Forster di vê derbarê de kirîye şayanê behskirinê ye.

Li gor Forster “em dikarin karakterên romanên wekî karakterê dûz (*flat*) û yê gilover (*round*) dabê bikin. Di sedsala 17an de ji karakterên dûz re *humour* dihate gotin. Carcar ji bo van tîp an jî karîkatur jî dihate gotin. Karakterê romanê yê dûz tenê ji taybetmendiyekê an jî fikrekê pêk tê. Dema ku ji yekî zêdetir taybetmendî li dêsmana (*yapı*) wê zêde bikî kêlekên wî/wê ditewe û dest bi giloverbûnê dike (...) Her yek ji karakterên ku lap dûz e dikare tenê bi risteyekê bête îfadekirin. Fêdeyeka karakterê dûz ew e kengê di romanê de derkevin holê bi hêsani dikarin bêne pênasekirin. Carekê eger ji bo xwendevan hatibin nasandin, ji bo careke din hewce nake ku bête nasandin. Bi tu carî ji bin hikmê nivîskar dernakevin.”²¹

Roman ku hewla temsîliyeta tevger, hest, serpehatî û êşên merivan asayî ji bo xwe dike mijar dema li dor karakterekî hemû xeml û xêza rindî, pakî, ciwanî, delalî, bêqisûr û dirustîyê dirêse, tîne karakterekî zêf û çêkirî derdixe meydanê ku pêşberî xwendekaran êdî ne pêbawer ne jî hezkirî ye. Çawa ku meriv di nav rindî û xerabîyê de diçin û tên, çawa ku carna bi rizadilî tev li reftareke xirab dibin wisa jî karakterê divê serbest be di hin tevger û xeberdanan de ku rê li ber wî/wê xweş dibe li ser sînorê xerabîyê de here û were, li xwe bihese û binase; bi rengekî li bin hikm û tehekkuma afirînerê xwe de nepelixe, ji tesarûfa vegêr bifilite. Di vê derbarê de Bahtin dibêje “karakterekê gerek bi qasî taybetmendiyên baş taybetmendiyên xerab, hem payebilind hem pespaye, hem komîk hem jî cidî li xwe bicivîne; karakterekê gerek ne wekî kesekî kamil û neguherbar, lê wekî kesekî di werar û pêşketinê de, wekî kesekî ku ji jîyanê ders digire, bête resimkirin”²² Karakterên bi vî rengî ku ji jîyan û rastîya xwe dûr in û ne pêbawerîyê bi meriv re çêdikin bi qewlê Bahtin xwedîyê mahîyeteke “neguherbar û ambalajkirî” ne.

Îcar eger em bîn li ser çend nimûneyên di romanê de meseleyê zelaltir bibe. Di romanê de, di nav di navbera karakterên baş û xerab de duberîyeke berçav heye. Karakterên baş, xêncî çend biryarên xwe yê xelet bi tu rengî bi taybetmendiyê xwe ya xerab ve dernakevin li ser dikê. Bavê Sîberê ku kesekî maqûl û qedirbilind tê teswîrkirin û xwe wekî “komunîst”ekî (r. 31) dibîne bi serbilindî, dema ku keça xwe dide zewicandin, bi qelenekî zêde bilind û bi daxwazên nelicî radibe. Vegêr derbarê vê helwesteka bavê Sîberê de nirxandin an jî şiroveyekî nake; dibe ku qelenê mezin ê ku ji bo Sîberê tê xwestin ji aliyê vegêr ve wekî pesinandina wê, wekî bilindkirina nirx û qîmeta wê hatibe berpêşkirin.

21 E. M. Forster, *h.b.*, rr. 107-109.

22 Michael Bahtin, *Karnavaldan Romana: Edebiyat Teorisinden Dil Felsefesine Seçme Yazılar*, (Wergera ji bo tirkî: Cem Soydemir), Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2014, r. 164.

Helbet di çarçoveya adet û toreyên ku li wan salan li kar bû ev babet dikare bi rengekî cuda bête nirxandin.

Vegêr herî zêde li dor Sîberê îdealîzasyonê çê dike û di piranîya tevgêr, xebêrdan û qewaman de başî û bedewîya wê dupat dike. Ji destpêkê û pê ve ew tenê nabe delalîya dêûbavê û hemû gundî û nasan herwisa dibe “delalî” li ser zar û zimanê vegêrê ku çîrokê ji bo me vedigêrîne û risteya yekê de ku dibêje “Sîber delalîya du malan bû; mala bavê û a apê.” Li vir teswîra “karakterê baş” ji bo nivîskar dikare astengîyan derxe:

“Sîber qîza gund î herî bedew bû, bi ser de jî cil û bergên ji ê hemûşkan çêtir û xweştir werdigirtin. Hevalên wê hemûşkan di dilê xwe de havîjî û xwezila xwe bi wê dianîn, lê qet jî ne çavreşî û dexesî. Û ev jî ji ber keysetê Sîberê ê baş, ji ber xwepiçûkdîtin, xwealçaxdîtin û berbîhêrî, rûnêrmî, helalî, û dilsozîya wê li hemberî wan hevalan. Her çi qasî jî ew ji hevalên xwe xweşiktir bû, her çi qasî jî cil û bergên wê ji ên hevalan tezetir û xastir bûn, lê wê tu caran quretî û pozbilindî li hemberî wa nîşan nedida.” (r. 6)

Karakter di nav pir-tebeqeyîya rengan de an xwe dispêre pakî û başiyê an jî berevajî vê konê xwe li rasta xerabîyan werdigire û her li wî warî dihêwîre. Başî û xerabîyê mitleq ku di teswîra piranîya karakteran de heye, wekî nîşaneyê tesîra romantîzmê xuya dike. Rindîyê ji karakterên xerab nikarî hêvî bikî, ewqas nexweş û dilxerab in. Lap xerab. Ev îdealîzekirin ne tenê li dor karakteran, herweha carcar li dor bûyer û tevgêran jî tê kirin. Bo nimûne dema ku vegêr qala mêrkirina Sîberê dike, bûyerê wekî tiştê seyr û zaf girîng derdixe pêş, bi vê risteyê ve; “Behsa mêrkirina Sîberê wekî bayê birûskê, ne ku bi tenê li temamîya gundê malbavên wê belav bû, lê gihişt hemû gundên cîran jî ên olka êzîdîyên navçeyê, bi ser de jî navçeyên din û bajarê Tîbilîsê, ji ber ku hemûşk li benda mêrkirina wê bûn, ên ku xortên wan ên zewacê hebûn, lê cesaret nedikirin hetanî behsa wê jî bikin, lê li bendê bûn, kanî ew ê kê begem bike û malbavê wê jî wê çi malbatê hîlbijêrin wekî hinkûfê xwe û kê jî layîqî qîza xwe.” (r. 34) Wekî ku tê dîtîna îdealîzekirina zêde ne tenê li ser merivan hatîye kirin carcar rewşan jî para xwe jê wergirtîye.

Herçiqas qewamên ku çêdibin, bibin qedera Sîberê jî, ew bi xwe jî aliyê biryar û xebêrdan û rola xwe ve nikare bibe serlehengeke kara, ji ber ku hemû biryar û bûyer li dor bavê Sîberê Eto û Xenzûrê wê Xemo rû didin. Dengê Sîberê, di bin sîya civata bavîksalar de û bavekî komûnîst²³ de, ne dengê bihîstinê ye; biryarên wê yên di derbarê jîyana wê de û bi taybetî jî zewacê de qet nayê qîsetkirin da ku xwîner bizanibin bê ka wê

23 Dema ku Eto û jina wî li ser zavê xwe xebêrdan ku di kolxozê de embarcîtyê dike, jinik dibêje de tu jî heta niha li kolxozê de xebîtyî, ka çi xêra te gihişte me. Eto dibêje: “Keda xelkê ye, gundîyên feqîr bi şev û roj kar dikin, xwêdanê dirêjin, lê ez jî keda wan bixwim. Ev dibe dizîyeke eşkere, lê ez jî *komûnîst* im, ez ê çawa lekeyê bînim ser navê komûnîstîyê. Keda xelkê wê çawa di ber min de here.”

lawikê ku hatîye xwazginîyê wê hez kirîye an na. Sîber ne li wê barûdoxê ye wekî ku bikaribe mêrekî hilibijêre, hez bike û li ser fikra xwe bibêje lêbelê em tenê li cihêkî ji xebardana Temir hîn dibin ku wî Sîber bi dilekî na, bi hezal dilî hebandîye (r. 52). Hemû biryarên derbarê jîyana Sîberê de ji alîyê dê û bavê wê ve tên girtin, lewma Sîber jî ji ber biryar an jî daxwaza xwe ya zewacê (ya ku em di metnê de bi tu rengî rasterast ji devê wê nabîhizin) poşman jî nabe û herweha bavê jî ji ber biryara wî sûcdar nake. Rola Sîberê berevajî nitirandina wê ya zêde ya di romanê de wisa qels e ku wekî xwîner meriv carcar bi mecbûrî şikê dibe li ser hebûna wê ya di vegêranê de. Jixwe, xwîner pir kêman dengê wê dibihîze, xwedîyê agahîyên zaf kêman e di derbarê hest û ramanê wê de an jî eger hebe evîna wê de. Tenê piştî mirina Sîberê, dema ji gundê malmêranên Sîberê jineke bi navê Gulnaz tê em ji gotinên Sîberê ji nêzik ve guhdar dikin. Li seranserê romanê li tu derê axaftina Sîberê ewqas berçav nabe qasê ku berçav û aşkere dibe bi gotinên Gulnazê ku ji devê Sîberê vediguhêze. Jixwe xwîner demeke dirêj li benda Sîberê dimîne ku kula dilê xwe ‘eyan bike: *“Meta Gulnaz, ez ji nav û namûsa xwe, ji nav û dengê xwe şerm dikim. Belkî mêrê min e, mêrê min ji gura bavê derneket, nehat pê min. Wê gavê êdî nabêjin: Pê nekirine, taba wê di destê xezûr û malmêranên din de tune bûye ...”* (r. 142)

Herçiqas Siber wekî karakterê sereke ango serleheng were dîtin jî wekî xwîner em zêdetir ji dinyaya hundirîn a Eto haydar dibin bi dîyalogên wî yê navxweyî re. Eto, bi daxwaz û nîqaşên bi jina xwe re, bi dudilî û bêbiryarî, bi poşmanî û xwezîyên xwe ve li navenda vegêranê de wekî karakterekî xurt dertê pêşberî xwîneran. Rola Eto mihim e ji ber ku hemû biryarên derbarê serlehengê romanê de ji alîyê wî ve tên dayîn; wî keça xwe bi rizadilî da malbata Xemo, wî Xemoyê ku dixwest Sîberê ji kurê xwe re nexwaze bi rêya kur qanî kir. Siber li ber çavê xwîner xemla karakterekê dîyar û zelal nagivire. Li hin deran jî li ser poşmanîya zewaca Sîberê, Eto dikeve nav mitalan û bi monologên serkeftî ve dem berfireh û tîr dibe. Nimûneyeke monologeke serkeftî ku di cihana hundirîn ya Eto de rû dide;

Min çî anî serê xwe û qîzê? Çî min di dest de ku min qîza xwe kir mala wî zalimî? Ez deyndar an jî xwîndarê bavê Xudo bûm ku min wiha hêsa, hema di roja pêşin de qîza xwe da kurê wî xerabî? Xelk, xwedîyên qîzan ên din, ên ne wekî min bêhiş û xefikê dilê xwe, berî ku qîza xwe bidin malekê, bi pirs û pirsîyaran pê dihesin, kanî mala ku behsa qîza wan dike, tê xwazginîyê wê çî mal e, neferên wê malê bûkan dihewînin an dizêrînin, zor û zilmê lê dikin. Em bi xeysetê zavê jî nehesîyan. Zaf jî me carekê dîtibû, zaf jî xortekî bi bejn û bal, aqil e, lê gelo, xorto xeysetê te çawa ye, tu yê bi mala xwe, jin û zarên xwe re bî an kole û kancikên xelkê, heval û hogiran bî, gelo, xorto, tu yî bihêrs î an milahîm î [...] (r.30)

Temsîla jinê bi rêya Siber, Gulnaz û dîya Sîberê dimeşe herçiqas rolên ku dayîka Sîberê daye ser mile xwe wê li ber çavan dîtbar neke jî. Qelsî û çend axaftinên li hember mêr û li berketina Sîberê û pê de, dayîka Sîberê zêde li pêş nîne. Ew jî wekî keçika xwe berî her tiştî bi deng û biryarên xwe nayê bihîstin. Bi tevgerên xwe ve bi têra xwe qels û pasîf e. Lêbelê, dema meriv ji romanê hîn dibe ku Sîberê hetanî astekî xwendîye û li gor keçên din ên gundî bi her hal û tevgerên xwe ve pêşeng e, ser wê re tune ye û herweha li gund pirtûkan dixwîne. Herçiqas xwendî û şareza be jî ji ber tehdeyên malxwezûranê xwe tu dengî dernaxe, li hember dernakeve, li ber xwe dikeve. Adet û toreyên ku wê demê li kar in tesîreke zaf xerab li ser jinê dike. Jin di dêleva ku derveyî adetan tevbigere fikra xwe an jî nerazîbûna xwe nîşan bide, vê rewşê wekî rewşeke adetî dipejirîne û bi awayekî ji halê xwe razî û qebûldar e. Jin li ber xwe nade da ku bibe takekesekî serbixwe, di nav civatê de bi rolekî rabe û li pey biryar û rastîyên xwe here. Hêmana pozberî û pevçûnê ku di navbera başî û xerabîyê de bi rengekî reşûspî çêdibe di navbera takekes û adet û toreyên civatê de jî rû dide. Lêbelê telaqa jinê di bin tesîra dab û nêrîtên jîyana gundî ya parastî de bi tundî ji alîyê Sîberê ve nayê qebûlkin. Ew ji bo rûmeta nav û nîşana xwe û ya malbata xwe şerm dike ku serî li hember neheqîyên malmêranên xwe rake û heqaretên ku lê tên kirin ji malbata xwe re bibêje û dev ji mêrê xwe berde. Li gel vê yekê, li vir tê dîtîn ku kevneperestîyeke civatî û insûrên zextê ku tên xuyanê li ser Sîberê kartêker in. Sîber ku hertim dixwaze li ser xeta normên civatî jîyana xwe berdewam bike, zaf pêbawer e ku qerara wê ya telaqê dê ji alîyê civatê ve baş neyê têgihiştin û civatê wê sûcdar bike ne ku malbata malxwezûran. Bo nimûne, di cihekî de dema ku telaqê diponije wiha dibêje: *“Kî yê bibêje qey pê nekirine, îdareya wê di destê xezûr û malmêranên xerab de tune bûye, hew taba xwe li ber zor û zilma wan anîye û ji qehran, bi mecbûrî, lê bi awayê xeydê vegeyîyaye mala bavê xwe. (...) Yekê bibêje: Qey çavlider bûye, yarê wê hebûye, bênamûsî kirîye loma...”* (r.142) Çawa ji vê xeberdanê jî tê fêmkirin di romanê de jin temsîla malbatê dike û nobedarê çand û nîzama malbatê ye, nabe ku ji rûyê wê de malbat hilweşe. Halbukî meriv hêvî dike jineke ku ewqas xûy û xisletên wê yên baş hene û dema zewaca wê ji alîyê hemû kesî ve tê bihîstin di heman demê de di tevgerên xwe yên din de jî xurt û têkoşer be, ji tirsê ku “xelk dê çî bibêje” jîyaneke bindest û stemlêkirî razî nebe.

Encam

Sîber ji alîyê afirandina karakteran de dişibe aqûbeta piranîya karakterên din ên edebîyata Sovyetê. Wekî romaneke ku “maweya nivîsandina” wê dirêj û wesîqeyeke jîyana gundewar ya kurdên li Ermenistanê bi taybetî bi temaya xwe ya ku zêde nebûye mijara vegêranên bi kurdî,

balkêş û mihim e. Sêwirandina karakteran di bin tesîra romantîzmeke req de, bi rengekî zêde îdealîzekirî hatîye çewisîn. Xêncî destnîşankirina komünîstbûna hin karakteran bi başî, vegêraneke zêde berçav tune ye ku xizmeta îdeolojîyê bike di romanê de. Îmajeke zêde qels, bêîrade û pasîf ya jinê di vegêranê de hatîye bicihkirin ku rê li ber pesindayîn û îdealîzekirina karakter û rewşan vekirîye. Bêyî ku li pir deran hewce be Sîber bi awayekî zaf zêde baş û bêqisûr hatîye wesifkirin. Berevajî vê yekê Xudo û neferên malbata wî jî bi tevger û kiryarên xwe yên carcar hovane û ne însanî ve hatine reşkirin bêyî ku behsa xislet an jî kirineke wî ya baş bête kirin. Rengavêtina karakteran di nav rewşeke reşûspî de, nedana dinyaya hundirîn û xwestek û hêvîyên Sîberê, li ser karakteran îdealîzekirina qencî û xerabîyê hin layenên sereke ne ku meriv dikare wekî qelsîyên vegotinê bi rêz bike.

Di gel van yekan, roman ji alîyê îslûb û ziman ve, ji alîyê hevok-sazîyên xwe û ji alîyê zimanê xwe ve ku ji nav folklorê kurdî tê dize bi awayekî xurt hatîye avakirin. Bi her awayî divê bête bi bîr xistin ku berhemên nivîskarê qedirbilind Wezîrê Eşo divê bi her alîyê xwe ve bête nixandin.

Çavkanî

Aktaş, Şerif. *Anlatma Esasına Bağlı Edebi Metinlerin Tahlili: Teori ve Uygulama*, Kurgan Edebiyat, İstanbul, 2015.

Aydoğan, İbrahim Seydo. *Guman 2: Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, weş. Rûpel, Stenbol, 2014.

Bahtin, Mihail. *Karnavalden Romana: Edebiyat Teorisinden Dil Felsefesine Seçme Yazılar*, (çev. Cem Soydemir), Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2014.

Boyîk, Eskerê. *Çanda Kurdên Sovêtê*, Weşanên Deng, İstanbul, 2012.

Eşo, Wezîrê. *Sîber*, Weşanên Lîs, Dîyarbekir, 2016.

_____. “Konferansa Kurdzanîyê ya Yekemîn li Yêrîvanê”, *Nûbihar*, j. 126, Stenbol, 2014.

Forster, E. M. *Roman Sanatı*, (çev. Ünal Aytür), Milenyum Yayınları, İstanbul, 2016.

Reşîd, Tosinê. “Sovyetler Birliğinde Kürt Edebiyatı” *Înatçı Bir Bahar*, Vecdi Erbay (Ed.), Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2012.

Sirkeci, İbrahim & Pîvîvara, Andrej. “Kurdish Studies in Russian Language: 1917-2017”, *Kurdish Studies*, [S.l.], v. 5, n. 2, 2017, p. 187-198.

Stevich, Philip. *Roman Teorisi*, (çev. Sevim Kantarcıoğlu), Akça Yayınları, Ankara, 2004.

Şamîl, Hejarê. *Diaspora Kürtleri*, Pêrî Yayınları, İstanbul, 2005

- Omarkhali, K. and Mossaki, N., "A History of Russian Kurdology: With a Brief Literature Overview", di nav: Hennerbichler, F. et al. (eds.), *Wiener Jahrbuch für Kurdische Studien. Die Geschichte von Kurdischen Studien und Kurdologie*. Nationale Methodologien und transnationale Verflechtungen, Österreichische Gesellschaft zur Förderung der Kurdologie, Wiener Verlag für Sozialforschung, Vienna, 2014, rr. 140-177.
- Tekin, Mehmet. *Roman Sanatı 1 Romanın Unsurları*, Ötüken Neşriyat, İstanbul, 2016.
- Ûsiv, Fêrikê. *Hesretdefter*, amd. Firîda Hecî Cewarî, Dîyarbekir, weş. Lîs, Ankara, 2015.
- Xelîl, Temûrê. *Antologîya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê*, Weşanên Na, Îzmîr, 2014.